# Gava Serdemeke Nû Dest Pê Dike

Civakan, heta dawîya demajoya neolîtîk, wekî klan, hoz û eşîr, bi awayekî xwebirêvebirina demokratîk a tevdehîyê, jîyana xwe qedandiye. Eger em ji klanê bidin rê, em ê bibînin ku civak bi milyonên salan, bi birêveberîya xweser jîyane. Civaka sirûştî ya di navbera salên 6 û 4 hezaran a b.z de ku wekî demajoya Neolîtîk tê binavkirin, bandeva (lûtke) vê demajoya dirêj ya dîrokî ye. Civaka Neolîtîk, di vê bandevê de, bi beş û pêkhateyên xwe ve çêbûye, bi pêş ketiye û bûye civakeke ku xwe bi rê ve dibe.

Çanda Til Xelefê ku wekî bandeva civaka sirûştî tê zanîn, bûye kan û jêderka çanda El Ubeydê ya li Mezopotamyaya Jêrîn. Bi demajoya sumeran re ku li ser zemîna çanda El Ubeydê bi pêş ketiye, bipêşketina civaka sirûştî averê dibe û şax jê çêdibin. Di demajoya vê şaxjêçêbûnê de, piştî bidawîbûna demajoyeke bipevçûn a pirhêlî, rewşeke bi çîn, hiyerarşîk û dewletperist bi rastê ketiye. Di navbera salên 3000 û 2500î yên b.z de demajoya bajêr, çîn û dewletê ku ji Urukê dest pê dike, êdî wekî serdemeke cihê bi pêş dikeve. Wê gava ku Sumer dibe şarezayîya dewletparêz, alîyên ku ji derveyî wê dimînin û nabin dewlet jî, wekî yekeyên Şarezayîya Demokratîk hebûna xwe diparêzin. Di gera dîrokê de, serdemên şer û pevçûnê yên giran ên di navbera şarezayîya demokratîk û şarezayîya çîndar, hiyerarşîk û dewletperist ku di çarçoveya şarezayîyê de bi pêş ketiye, li ser vê esasê qewimîne. Ji vê û şûnde, êdî dîroka fermî bi dîroka nivîskî hatiye destpêkirin û jîyan û sîstema civakî ya bi hezarên salan mîna ku tune be hatiye hesibandin.

Dîrok, ne dikare di ser demajoya fermî ya nivîskî re ne jî di ser nêrîneke çînparêz re were xwendin. Divê em teza xwe ya dîrokê bi çêbûna klanan bidin destpêkirin. Nakokîya ku di deqbenda (kontekst) civaka dîrokî de derketiye rastê, di navbera şarezayîya demokratîk û civaka çîndar, hiyerarşîk û dewletperist de ye.

Sîstema şarezayîya dewletperist, bi awayekî sîstematîk û bi maşandina wê, derb li civaka sirûştî daye û ew bi alî sînor ve biriye ku em wê wekî "civaka polîtîk-rewiştî" pênase dikin. Şarezayîya dewletperist ku bi pawanên kedxwarî û desthilatê xwe heyî dike, çi gava nikaribe vê bike, ne dikare pawanên kedxwarîyê ne jî pawanên desthilatê saz bike. Sermiyandarî, gava dijberên xwe ji navê rakirine karîye pawanên xwe bi pêş ve bibe. Loma jî, hincetên hebûnê yên pawanên desthilatê ev in; derbê li civaka polîtîk-rewiştî, bidin, wê talan bikin û ji bo ku bikarin wê bi kar bînin, bikin wekî kelûpelekê. Ji dîrokê heta roja me ya îro, pratîkên ajarqelandinê (jenoside) yên li dij civak, jin û sirûştê hatine pêkanîn, vê yekê nîşan didin.

Şarezayîya çîndar, hiyerarşîk û dewletperist, ji du serîyên dijhev ên pêdeçûna dîrokê, li dij civakparêzîyê, wekî dijcivakparêzîyê û dijsîstemekê ku serîyê neyînî pêk tîne, bi pêş dikeve. Pêdeçûna dîrokê, di navbera du serîyên dijhev de ye; serîyekî şarezayîya ku dewlet û desthilat navîna wê pêk tînin, serîyê din jî forma civaka komunal a dewletavanekirî ye. Her wiha, sîstema çîndar, hiyerarşîk û dewletperist, li ser zemîna civaka neolîtîk û bi neyînkirin û mandelekirina wê bi pêş ketiye. Loma jî,

sîstema dewleta çîndar, gava wekî rêbaz demajoya civaka neolîtîk neyîn û mandele kiriye, di heman gavê de jî, bi komplo û operasyonên her cureyî, demajoya bi hezarên salan bindoşek kiriye û dîroka fermî bi hebûna xwe daye destpêkirin.

Li her cihê ku zihnîyet û laşê dewleta çîndar lê heye, gengaz e ku mirov li dij wê, bi awayekî diyalektîkî, behsa civaka şarezayîya demokratîk bike. Wê hingê, hemû pêkhateyên ku dikevin nav çarçoveya zihniyeta şarezayîya demokratîk, divê programeke wan a bisîstem hebe, yekeyên wan birêxistinkirî bin û divê ew li ser hîmê vê programê, xwe bi awayekî tevdeyî bi rêxistin bikin.

Tevî ku sîstema şarezayîyê ya çîndar, hiyerarşîk û dewletperist kêm zêde ji % 10ê civakan dinimîne jî, ji wan hatiye û karîne xwe wekî pawanên qerase bi rêxistin bikin. Hemin ku ev yek ji wan tê, gelo çima ji % 90ê yekeyên şarezayîya demokratîk a civakan, tevî ku di rewşeke biavantaj de ne jî, nikaribin xwe bi rêxistin bikin.

Divê em destnîşan bikin, gava em dibêjin birêxistinkirin, em behsa birêxistinkirineke hiyerarşîk a klasîk nakin ku li ser ê tê birêvebirin û yê bi rê ve dibe pêk tê. Birêxistîbûn, rastîyek e ku di kakil û tevîneka civakê de heye. Ji bo ku civak bikarin di jîyanê de xwe derbibirin, pêwîstî pê çêbûye her tim bi awayekî kolektîv tev bigerin, hemû pêdivîyên jîyanê tespît bikin, rêgezên jîyana hevpar destnîşan bikin, li ser wan rêgezan hewcetîyan dabîn bikin û tiştên şaş û rast ji hev derxin. Her wisa, ziman û awayê birêxistinbûna civakên ku li ser vê bingehê ava bûne, wekî awayê birêxistinbûna civaka demokratîk a konfederal çêbûye. Birêxistinbûna ku herî zêde li jîyana civaka dîrokî digunce, konfederalîzm e. Pêdeçûna dîrokî ev rastî çespandiye. Ji vê hêlê ve, mirov dikare pênase bike û bibêje: Wekî zihnîyet û laş ji derveyî sîstemê ne, lê belê di nava sîstemê de, li ser hîmê konfederalîyê, bi birêxistinbûnên sist qadên azad tên vekirin; di van qadan de, bêyî ku pêwîstîyê bi dewletê bibîne, bi rêbaza demokrasîya yekser ku gav bi gav dewletê ji jîyana xwe dûr dixe û qadên heyî mezintir û berfirehtir dike û li ser vê bingehê xwe bi rê ve dibe.

**Gelo yekeyên şarezayîyê yên demokratîk dikarin xwe pirtir bikin û bibin kûrewî?**

Hêmanên şarezayîya demokratîk wekî yekeyên civakî hene, lê belê ji ber ku paradîgmayeke wan a îdeolojîk-polîtîk tune ye, ne birêxistinkirî û tevdeyî ne. Yekeyên polîtîk ên rewiştî ku yekeyên civaka demokratîk in, bi êrîşbirinên hertimî yên sîstema şarezayîya çîndar û dewletperist hatine tepisandin. Lê ji vê yekê wate ne ew e ku êdî civaka rewiştî ya polîtîk li holê nemaye. Her çend gelek êrîş li wan hatine kirin û wekî sîstemekê ji hev belawela bûbin jî, bi awayekî ji awayan, bi paralelîya şarezayîya dewletperist, hebûna wan heta roja îro hatiye.

Sîstema şarezayîya dewletperist, misêwa xwe di ser zordestî û kedxwarîyê û di ser şêweyê pawanîyê re bi rêxistin dike, xwe pirtir dike û xwe heyî dike. Ji wê gava ku bi rastê ketiye û heta roja îro, mekanîzmayên qerase yên îdeolojîk, çandî, siyasî û leşkerî çêkirine û di ser wan re xwe li civakê ferz kiriye, ew bi rêxistin kiriye û taybetîyeke hertimî jî lê bar kiriye.

Me destnîşan kir ku sîstema çîndar, hiyerarşîk û dewletperist, li dij civakê ye û ji pêdeçûna civaka dîrokî averêbûnek e. Kana esasî û feraseta civaka dîrokî ku divê mirov xwe bispêriyê, rastîya civaka komunal a sirûştî ye. Lê belê, di gel pêdeçûna nivîsê, gava em behsa sîstema şarezayîya dewletperist û bipêşveçûna wê bikin, em ê ji hin rêbazan mînakan bibêjin. Ew mînak, ne ew rêbaz in ku sîstema dewletperist bi xwe peyda kirine. Lê ew rêbaz in ku jîyana civakî bi pêş xistine. Sîstema dewletperist, her wekî di gelek mijaran de jî wisa ye, vê rêbazê jî ji destê civakê girtiye û bi wateyeke dijber ew bi kar anîye. Ev rêbaz, di zimanê berdewamîya civakî de, ji bo xweparastinê li ser pirbûn û mezinbûnê hatine danîn. Ev yek, rêgez û pêşmerca bivênevê ya hebûna civakî ye.

Şarezayîya dewletperist gava li ser vê esasê xwe bi pêş ve dibe, divê hêmanên şarezayîya demokratîk, li dij vê yekê xwe bi rêxistin bikin û xwe heyî bikin. Heke nikaribe wekî heyîn xwe bi pêş bixe, ew ê nikaribe xwe ava û heyî jî bike. Li pêşber pawaneke qerase û birêxistî, rewşeke nehatî birêxistinkirin heye. Bi wateya civakî, birêxistinkirineke tevdeyî nehatiye kirin. Jixwe şans û keyseke wan a wisa jî çênebûye. Ji ber ku sîstema şarezayîyê ya çîndar û dewletperist, gava ji hêlekê ve xwe bi rêxistin kiriye ji hêla din ve jî bi navgîn (instrument) û amrazên leşkerî, siyasî, îdeolojîk û çandî, misêwa derb li yekeyên civaka sirûştî xistine. Bi navgîn û amrazên zorlêkirinê, xwe li dij civakê bi rêxistin kiriye û bi awayekî maddî û manewî xwe kiriye serdest. Serê pêşîn di ser zihnîyetê re piştre jî bi awayekî maddî ev yek li xwe kiriye navgîn û amrazên xurt.

Rewşa yekeyên şarezayîya demokratîk ne di heman astê de ye. Çimkî ji bilî yên ku bi kêrî kudandina jîyana wan tên, zêde amrazên wan tune ne. Ji ber ku her tim pêkanînên zorlêkirinê li wan tên qewimandin, ji hev belawela ne û amrazên wan ên ku ew ê bikarin ji bo xwe wan bi kar bînin kêm in, derfetên wan hindik in û xwe bi xurtî bi rêxistin nekirine. Ji ber ku ji bo kudandina jîyana xwe ya rojane her tim li ber kar û xebatê hatine asêkirin, bi awayekî ji awayan bûne pêgirtî. Yekeyên şarezayîya demokratîk, ji ber van rêbazên ku hatine pêkanîn, di bin zordestîya dewletan de bi sîstema kedxwarîyê ya dewletan ve hatine girêdan û derfeta xwebirêxistinkirina wan ji navê hatiye hildan. Ji ber van çewisandin, berbend û ji ber hincetên dîtir ku roj bi roj bi kûr de diçin, divê mirov bi çarçoveyeke berfireh û bi kûrayî li sîstema şarezayîya demokratîk bihizire.

Gava yeke tê gotin, gelo mebest jê çi ye? Mebest ji gotina yekeyê, ew mirov in ku kêm zêde hay ji rewşa li dij sîstemê hene û pê re dijîn. Hêzên şarezayîyê yên dewletperist bi sîstem in, lê sîstema van yekeyan nîne. Ji takekesan heta bi hemû yekeyan, her kes di nav vê yekê de cih digire. Ji ber ku Marx, bi nêrîna çînparêzîyê ranêzîkî li dîrokê kiriye, nakokîya hîmî ya di civakê de heyî, li ser bingeha nakokîya di navbera kole-efendî, feodal-gundî û karker-karsaz de heyî, nirxandiye. Di nav koleyan de jî kategorîyeke dîyar saz kiriye. Nakokîya hîmî, di serdema koledarîyê de wekî koleyên nîvazad û koledar, di serdema feodalîzmê de jî wekî gundîyên xweyî erd û gundîyên erdê wan tune, di serdema kapîtalîzmê de jî, wekî karker û burjuwazî kategorîk kiriye. Herçî Serok Öcalan e, ji ber ku bi awayekî tevdeyî li ser beşên civakê

yên ku ji derveyî şarezayîya çîndar û dewletperist dimînin, disekine û yekeyên ku tevdeyîya civakê pêk tînin, bi awayekî ku çînên civakî jî tê de bin, wekî civaka bindestkirî pênase kiriye. Kes jî endamên vê yekeyê ne, çîn jî di nava van yekeyan de ne. Loma jî, hemû beşên civakê, yên ku hay ji hebûna xwe hene û li dij şarezayîya dewletperist wekî hebûnekê disekinin, yekeyên şarezayîya demokratîk in.

Heke ji hêla rastînîya civaka dîrokî ve rewş wisa ye, nexwe birêxistinbûna van yekeyan wekî bêgavîyekê li pêş me ye. Xeleka hîmî ya paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û parêzvana azadîya jinan ji vê derê derdikeve pêşberî me. Heke şarezayîya çîndar, hiyerarşîk û dewletperist ev çend birêxistinkirî ye, heke dikare xwe di her warî de bi rêxistin bike, ne gengaz e ku yekeyên şarezayîya demokratîk li hember wê ev çend birêxistinnekirî, belawela û bêsîstem bin. Rêya xwebirêxistinkirin û bisîstemkirinê ya yekeyên şarezayîya demokratîk ew e ku divê li ser bingeha piranîparêzîyê xwe bi rêxistin bike û sîstema xwe saz bike. Egerna, geşedanên dîrokî yên bi pênc hezarên salan bi me daye nîşan ku ew ê li hember sîstema çîndar, hiyerarşîk û dewletperist têkeve nav gelemşeya hebûnîya birêxistinkirî û ew ê her û her bimîne bindestkirî. Ji bo ku ev rewş lê neqewime, bipêşxistina tevgera veavakirinê tiştekî bivênevê ye. Divê yekeyên şarezayîya demokratîk, xwe ji rewşa xwe ya ku xwe bi rêxistin nake, ji hev belawela ye û bêsîstem e bifilitîne û dawî li têkşikîna xwe ya li hember şarezayîya çîndar, hiyerarşîk û dewletperist bîne. Rastîya civaka dîrokî bi me daye nîşan ku ev yeke hene lê, belê divê ew xwe ava bikin.

Di avakirina civakî de, piranîya çendanî ya van yekeyan, ancax dikare bi birêxistinbûnê bigihîje hêza xwe ya li ser çawanîyê. Wekî çawa şarezayîya çîndar, hiyerarşîk û dewletperist, roja îro, berginda birêxistinbûna kûrewî ye, divê hêzên şarezayîya demokratîk jî, ji yekeya herî piçûk û jêrîn dest pê bikin û di asta kûrewî de bigihîjin birêxistinbûneke berfireh. Tiştê ku divê bal pê dayîn; ji bo hebûnê, pirbûna bi wateya laşî û zihniyeta civakî ye û ev yek qanûna bivênevê ya jîyan û azadîyê ye.

Em dibînin, zihniyeta şarezayîya çîndar, hiyerarşîk û dewletperist, di demajoyeke dîrokî ya bi pênc hezar salan de, di jîyana sumeran de bi rastê dikeve û çawa gav bi gav mezintir dibe û dibe hêzeke dinyayî. Nepena hebûna zihniyeta şarezayîya çîndar, hiyerarşîk û dewletperist di xwemezinkirina wê de ye. Ji ber ku pir baş dizane, heke xwe bi pêş nexe û mezin neke, hebûna wê dê bikeve ber talûkeya tunebûnê. Rêya parastina hebûna xwe, pergala xwe, sîstema qazanckirina xwe û çerxa xwe ya zorlêkirin û kedxwarîyê ew e ku divê her tim xwe pirtir bike, xwe mezintir bike û xwe di asta kûrewî de bi rêxistin bike. Pir giring e ku mirov ji demajoya ku ji bajarê Urukê yê sumeran dest pê kiriye, fam bike. Divê mirov baş ji çîroka yekeya desthilatê fam bike ku li bajarekî piçûk (Uruk) bi rastê dikeve û xwe digihîne asteke kûrewî ya birêxistinkirî û bisîstem.

Sîstema şarezayîya çîndar, hiyerarşîk û dewletperist, pêşî li warê ku jê derketiye û piştre jî, gav bi gav di asteke navneteweyî de, bi pawanan, xwe kiriye sîstemeke gerdûnî û ji yekê gihîştiye bi milyonan.

**Wekî yekeya şarezayîya demokratîk, derketina rastê ya Neteweya Demokratîk a li Kurdistanê û demajoya pirhêmanîbûnê**

Giring e ku em vê pirsê bikin û li serê bifikirin: Gelo yekeyên şarezayîya demokratîk dikarin di ser yekeyên piçûk re xwe bi rêxistin bikin û ji hegemonyaya pawanên desthilata kûrewî rabihurin û wan ji navê rakin? Em li ser Kurdistanê bikudînin. Yekeya me ya neteweya demokratîk ya ku derketiye rastê, heke tenê di çapana Kurdistanê de bimîne, ew ê nikaribe wekî yekeya civakî ya rewiştî-polîtîk xwe ava bike, têkoşînê bidomîne û pawanên herêmî û navneteweyî têk bişikîne. Yekeya rewiştî-polîtîk a ku li ser hişmendî û birêxistinkirina navxweyî li Kurdistanê bi pêş dikeve, çendî ku bikare xwe bi pêş bixe, di asta dinyayî de bibe navneteweyî, xwe bigihîjîne asteke gelemperîbûnê û bibe hêzeke di asta dinyayî de, ew çend dikare bandora xwe berbelavtir bike û wê hingê dikare guherîn û veguherînê bi pêş bixe. Ev yekeya birêxistinkirî, ancax dikare bi xwemezinkirin û navneteweyîbûnê xwe biparêze.

Em çi qas bizanin ku ev yeke hem di asta herêmê hem jî di asta dinyayî de hêja ye, ew qas jî giring e ku em bizanin û fam bikin, heta ku ev yeke xwe neke pirhêmanî ew ê nikaribe bigihîje armanca xwe. Ev yekeya ku li Kurdistanê bi pêş dikeve, divê serê pêşîn di ser têgihên "hevgirtina gelan, biratîya gelan" re ku datîne rastê, di asta herêmî û dinyayî de, tezên xwe yên li ser sîstema konfederal berbiçavtir bike û berdewamîya hebûna wê jî bi vê yekê ve girêdayî ye. Ev têgih, hema wisa çawalêhato û bi wateyeke romantîk nayên bikaranîn. Ev feraseteke stratejîk e û di çarçoveyeke bivênevê de ye. Loma jî, wekî çawa pawanên navneteweyî bi awayekî bisîstem û di nav hev de, bi rêxistin bûne, divê yekeyên şarezayîya demokratîk jî di nav hev de bi rêxistin bibin û di asta herêmî û kûrewî de bibin xweyî dezgeh. Ji bo bicihanîna vê armancê peywirên gelekî giring li benda me ne. Tekane rêya veqetîn û derketina ji sîstema çîndar, hiyerarşîk û dewletperist, bicihanîna van peywiran e. Peywirên rewiştî, polîtîk û intelektuel, peywirên herî rast û hîmî ne.

Ev peywir pir bi pihêtî bi hev ve girêdayî ne. Loma jî, bi qasî ku bi hev ve girêdayî ne, rola wan jî bi serbixwebûna wan ve girêdayî ye. Bêyî ku ev her sê peywir werin bicihanîn, tevgereke bisîstem û birêxistinkirî nikare bi pêş bikeve. Ji ber hindê jî, serê pêşîn em ê van her sê peywiran pênase bikin, pê re em ê destnîşan bikin ka vê yekê di dîrokê de çawa geşe bi xwe da û şarezayîya dewletperist van her sê awayên peywirê bi çi awayî dinirxîne û di dawîyê de jî em ê behsa kurtedîroka şoreşên gerdûnî bikin.

Peywira intelektuel, ew diyardeya zihnîyet û ramanê ya bisîstem e ku di asta civaka demokratîk de bi pêş dikeve. Hêza ramanê û çalakî dikeve nav çarçoveya peywira intelektuel. Bervekirî ye ji bo teşegirtina neyînî-erênî ku ji ber vezelokîbûna zihniyetan diqewime. Hêzên desthilatdarîyê yên ku li vê yekê şiyar bûne, herî zêde êrîş birine ser diyardeya zihnîyetê û zihnîyetên xwe kirine serwer. Nepena serketina wan di vê yekê de dihewe. Ji ber hindê jî, divê yekeyên şarezayîya demokratîk jî serê pêşîn çalakîyên zihnîyetî çêkin. Ji bo ku mirov bikare yekeyên jihevbelawelabûyî û

birêxistinnekirî bîne ser hev, çalakîyeke intelektuel pêwîst e û ev yek peywira herî pêşîn e.

Peywira rewiştî û rewişta civakî, heta tu bibêjî bes di bin hikmê êrîşbirin, çewisandin, çilvirîkirin û maşandinê de maye. Bi tevî vê yekê jî, nekarîne taybetîyên rewiştî yên civakan bi temamî ji navê winda bikin. Ruh û taybetîyên civaka rewiştî, ew diyarde ne ku pênc hezar sal in dûçarî êrîşbirinan tên. Sedema ku hegemonya ev qas êrîş dibe ser rewiştê ew e ku dixwaze civakê ji kirasê civakîbûnê derxe.

Polîtîka, bipêşxistina civakê ya bi awayekî baş, birêxistinkirina wan a di her qadê de û xwebirêvebirinê di xwe de dihewîne. Polîtîk ew tişt e ku bi awayekî rojane azadî, wekhevî û jîyaneke dadîyane were birêxistinkirin, azadî were bipêşxistin û berfirehkirin û pê re jî berdewamîkirina azadîya hatî bidestxistin e. Di vî warî de, tiştê dikeve behsê ev e; divê birêxistinkirineke wisa çêbibe ku civak bi xwe jîyana xwe bi rê ve bibe. Piştî ku sîstema çîndar, hiyerarşîk û dewletperist hatiye, birêvebirina dewletî û burokratîzm ketiye şûna polîtîkayê. Ji ber ku civak bê polîtîka maye, ji kirasê civakbûnê jî derketiye. Divê di dema xebatên avakirinê de, polîtîkaya ku ji civakê hatiye dizîn, di navenda xebata civakî de were bicihkirin. Ji bo vê yekê jî, yek ji peywira sereke ew e ku divê civak bi awayekî rojane were avakirin.

**Bingeha krîzên sîsteman, krîza ıntelektuelî ye**

Em bi bicihanîna van peywiran re rû bi rû mane. Heta ku ev peywirên bingehîn û bivênevê neyên bicihanîn, tu bipêşketin çênabe. Ne tenê em in ên ku van rastînan dibêjin. Ne tenê em in ên ku van heqîqetên derbirandî, diçespînin. Me ev rewş çênekir. Ev hemû, wekî rastîyên dîrokî-civakî, rastînîyên sereke ne.

Piştî klanan, yekeyên civakî yên ku herî demdirêj di civakê de mane, hoz û qebîle ne. Hozan, wisa di nava hev de peywirên rewiştî, polîtîk û intelektuel, bi cih anîne. Em dibînin ku di hozan de, ji bo van peywiran, jihevcihêbûneke pir giring pêk nehatiye. Heke civakek çêbûbe, heke bipêşketina wê hertimî be, ew ê serê pêşîn li ser çalakîyên zihniyeta intelektuelê bi pêş bikeve. Ji bo biyekbûnê zihniyeta civakî û tevdeyîya tevlivînê pêwîst e. Ji hêla din ve, hewcetî pê çêbûye ku rewişta ku çîmentoya mayîna bi hev re ye, wekî tevdeyîya rêgezan were birêxistinkirin û hevpêwendîyên civakê werin birêkûpêkkirin. Heke li cihekî birêxistinîbûn hebe, wê pergala rewiştî jî wekî derbirana wê bi pêş ve biçe. Herçî peywirên polîtîk in, gava li ser hîmê parastin, birêxistinkirin û ewledarkirina hewcetîyên rojane sîstemeke hevpêwendîyê were danîn, wê ev yek bike ku bibin polîtîk.

Di eşîran de jî rewşeke wisa heye. Eşîr, bi gelemperî bi peywirên polîtîk re eleqedar in, eşîr pêkhateyên polîtîk in. Malbat û klan di nava hozê de bi asteke dîtir tên nimandin, loma jî eşîran cudatîyek daye der. Ji ber ku jîyan roj bi roj dijwartir û berfirehtir bûye, hem helwesta mirovan a li pêşber hilberandinê hem jî guherînên di hevpêwendîyên wan de û wekî din jî talûkeyên ku dibe ku biqewimin, kiriye ku jibêgavî mezin bibin. Vê mezinbûnê, eşîr derxistine rastê. Eşîr, zêdetir ji biyekbûna hozan çêbûne. Eşîrên ku li ser biyekbûna hozan çêbûne, xwe bi awayekî konfederal bi

rêxistin kirine. Loma jî, konfederalîzma eşîran, sîstemeke polîtîk e. Birêxistinbûna klanan, zêdetir birêxistinbûneke rewiştî ye -û rêgeza 'yek ji me ji bo hemûyên me, hemûyên me ji bo yekî ji me' tê de lidar e'- lê belê eşîr wekî formeke polîtîk bi pêş de hatine. Polîtîka di eşîran de lez girtiye. Di eşîran de, rewişt bi awayekî beşkî bûye sazî û di ser azmûn û çandê re hatiye veguhastin. Ji ber vê yekê jî, di nava eşîrê de, rewişt; wekî kevneşopî û bi awayekî veguhastina azmûna jin û salmezinan bi pêş de hatiye. Ji ber ku di nava eşîran de, klan û hoz ji hev belav nebûne, kevneşopî ji klanê bo hozê û ji wir jî bo eşîrê hatiye veguhastin. Di nava eşîrê de, şaman, keşîş, jin û pîrên kulozan, zihnîyet û rewşenbûna intelektuel bi pêş xistine.

Di dînên Brahîmî de, her çend taybetîyên xweser yên van peywiran hebin jî, ew jî bi heman rengî û di nav hev de bi pêş ketine. Di îslamîyetê de medrese sazîyên intelektuel in. Rewişta mizgeftê di îslamîyetê de, sazîyekê dide der. Awayên desthilatdarî û birêvebirinê rewşeke polîtîk derdibirin. Awayê çêbûna pêxemberan, ji ayetan heta bi awayê ramana wan, wekî derbirana çalakîyên intelektuel geşe dide xwe. Xebatên intelektuelî, di nav civakan de tên berbelavkirin û awayên zihnîyet û tevlivînê tên çêkirin. Dîn, di civakê de, çi qas bikarin zihnîyetekê çêkin, di bicihkirina sîsteman de ew qas serketî dibin. Ev çalakî, çendî serketî bin ew çend jî mezinbûnê pêk tînin. Ji Nemrûd heta bi firewnan, mirov dikare rabûna pêxemberan a li dij sîsteman, 10 ferman, kitêbên pîroz û wehîyan wekî geşedanên rewiştî û intelektuelî binirxîne.

Di cihûyan de, qralîya Qudsê wekî demajoyeke polîtîk bi rastê dikeve. Di xiristîyanîyê de, avakirina ramana rizgarîyê, çalakîyeke intelektuel e. Xwebirêxistina wan a 300 salî, çalakîyên polîtîk in ku giranîya rewiştê li ser e. Paşê jî, dewleta ku ava dibe yan jî tiştên ku di dewletê de didin der, wekî çalakîyên polîtîk bi pêş dikevin.

Di warê dînî de, ji ber ku peywirên rewiştî û polîtîk pir zêde di zik hev de ne, ev yek bûye sedem ku taybetîyên wan ên afirîner xurt nebin. Ji ber ku her sê peywir, pir zêde di zik hev de ne, vê yekê kiriye ku serbixwebûna wan jî qels bimîne. Li Îyonya, Grek û Romayê, entellektualîzm serbixwebûna xwe bi dest xwe ve tîne. Fêrgehên felsefeyê sazîyên intelektuel in û berbelav in. Ev peywir, di geşedanên xwe de yên ji pêgirtîtîyê ber bi serbixwebûnê ve, peywirên ketî behsê wekî geşedaneke giring dide der. Li Romayê rewişt, di peristgehan de geşe bi xwe dide. Herçî polîtîka ye, bi teşeya cimhûriyetê û wekî senato û împarator hatiye pênasekirin û ji yekhêmanbûnê rizgar bûye.

Di modernîteya kapîtalîst de, çalakîyên intelektuel, pir zêde di zanîngehan de asê bûne û êdî bûne pêgirtî. Loma jî intelektuelîzm ji serbixwebûnê ketiye. Warên zanistê bûne pêgirtîyên netewedewletê. Rewiştê derbeke wisa xwariye ku di dîrokê de nehatiye dîtin û hew maye ji navê rabe û qanûnên pozîtîf û hiqûq ketine şûna wê. Herçî polîtîka ye, bi parlementoyê ve hatiye sînorkirin û bertengkirin. Li şûna polîtîkaya ku ji civakê hatiye girtin, burokrasî, rayedarî û sîstema dewletê bi pêş ketine. Modernîteya kapîtalîst, di gel ku çalakîya intelektuel kiriye pawana xwe, ew di zanîngehan de asê kiriye û kiriye navgîn û amrazeke ku misêwa ji bo berjewendîyên netewedewletê li kar dikeve, civak jî bi rêjeyeke mezin ji peywirên intelektuel hatiye

dûrxistin. Serwerîya vebir a modernîteya kapîtalîst, sîstema netewedewletê ye. Civak hemû, li ser bengeha netewedewletê bi pergalekê ve hatiye girêdan. Bi vî awayî jî civak ji peywirên xwe yên hîmî û esasî bêpar hatiye hêlan.

Li welatên bi sosyalîzma reel dihatin birêvebirin jî, polîtîka di navendekê de hatiye nirxandin û ji civakê hatiye dûrxistin, rewiştê şûna xwe ji hiqûqa pozîtîf re hêlaye. Polîtîka bi rêya netewedewletê hatiye kirin. Welatên bi sosyalîzma reel dihatin birêvebirin, peywirên intelektuel, ne wekî peywirên civakê hemû, lê belê wekî çalakîya beşeke ji mirovên elît û bijare qebûl kiriye, dor lê teng kiriye û civak jî ji derveyî vê hêlaye. Her çend şoreşên sosyalîst li ser navê ramaneke nû çêbûbin jî, di dogmatîzmeke kûr de çûne. Ji ber vê yekê jî, sosyalîzma reel ku xwe dispêre ramaneke nû, nekarîye geşedanekê bide xwe û ji ber tunebûna ramanekê rûxîyaye.

Ji bo şarezayîya çîndar, hiyerarşîk û dewletperist jî, ev her sê peywirên esasî ku ji sumeran heta bi serdema kapîtalîst tên pênasekirin, ên bingehîn in. Wan li ser van her sê peywirên bingehîn xwe ava kiriye. Her du şarezayîyan, reng û rolên ku awayên wan ji hev cuda ne, dane van peywiran.

Hêzên şarezayîya demokratîk, ji ber ku ne bi sîstem û program in, wan nekarîye ferqîya xwe û jêcudabûna xwe bidin der, ji ber ku hemû bipêşdehatinên niyetbaş negihane asteke paradîgmayî, serdestan mohra xwe li rewşa dawîn xistiye.

Di bingeha krîzên bi her cureyî de, krîza intelektuel heye. Wekî çawa hemû bipêşketinên di dîrokê de encamên çalakîyên zihnîyetê ne, di vê serdema ku em tê de dijîn jî, di bingeha hemû krîz û gelemşeyan de ku çêdibin jî, krîza zihnîyetê heye. Tew bi ser de jî, 'hemû avakirinên civakî berhemên mirovan in.' Ev hemû bi zihnîyetê çêdibin û geşe didin xwe. Heke krîzên sîstemî hebin û krîz bi krîzên awarte tên birêvebirin, nexwe em dikarin bibêjin, krîzeke bêhenek a intelektuelî heye. Bêyî ku raman û zihnîyet di xwe de asê bibin, krîz nikarin çêbibin û berbelav bibin.

Eger em ji hêla felsefeyên positîvîst û metafizîk ve bala xwe bibin serê, em ê neşên krîzê biçespînin. Demajoyên bipêşveçûnê yên civakî yên li ser xeteke rasterast, bi qanûnên dîyarkirî tên derbirandin û ravekirin. Qanûnên sirûştê hene û mirov tenê binbar in ku van qanûnan bizanin û tê bigihîjin. Loma jî, zêde heqê wan ê destkarîlêkirinê jî tune ye. Felsefeya marksîst jî wisa ye. Ranêzîkîyeke determînîst lidar e. Marksîzm, krîzan zêdetir li ser nakokîya ku di navbera hêzên hilberandinê û hêzên hilber de heye, rave dike. Vê yekê wekî derbirana kedxwarîyê qebûl dike. Loma jî, di çarçoveya nihêrîna xwe ya felsefîk, di likarketina sîstemê bi xwe de li gelemşeyê digere. Di vê yekê de, tiştên ku wekî esas tên qebûlkirin qanûn in, vîna mirovan û vîna civakê wekî esas nayê qebûlkirin. Çêbûna zihniyeta ku dibe sedem ku ew were wê astê yan jî wê nakokîyê digihîne wê astê, wekî esas nayê qebûlkirin. Wekî qanûneke bipêşketina civakî tê qebûlkirin. Loma jî, krîzên civakî yên dîrokî, li ser vê bingehê, wekî qederekê tên nirxandin. Divê mirov çareserîya krîzên civakî jî, di veguherîna zihnîyetê de lê bigere.

Aşkere ye ku krîzeke kûr ya intelektuelî lidar e. Rabihurîna ji krîzê ancax bi demajoya intelektuel gengaz e. Di gera dîrokê de, şoreşên intelektuel çêbûne. Bi şoreşa

intelektuel, gelemşeyên sîstemê hem jê hatine rabihurandin hem jî di gel şoreşên civakî rêçik jê re hatine peydakirin.

Di navbera salên 6 hezar û 4 hezaran a b.z de, çandinî bi pêş ketiye, riwek û ajal hatine kedîkirin, awayekî birêxistinbûna civakî çêbûye, teknîk hatiye bikaranîn, hunera birêvebirinê bi pêş ketiye, huner û estetîkê geşe bi xwe daye, ramana anîmîst bi kûr ve çûye, berhem bi qasî deh caran ji hev pirtir bûne û her wekî di mînaka Til Xelefê de jî wisa ye, çanda neolîtîk berbelav bûye û hemû îcad û vedîtin bi pêş ketine; ev hemû jî berhemên asta raman û zihnîyetê ne. Ji vê hêlê ve, em demajoya ku di navbera salên 6 hezar û 4 hezaran de geşe bi xwe daye, wekî şoreşa intelektuel a yekem bi nav dikin.

Şoreşa entelletuel a duyem di sumeran de çêbûye. Heke şoreşên intelektuel xizmetî bipêşketina civakan bikin û wê kûrtir bikin, hingê erênî ne. Jixwe şoreşên intelektuel li ser navê rewşenbûn, bipêşketin û bikûrdeçûna civakan çêdibin. Loma jî, heke şoreşên intelektuel di xizmeta civakan de bin, erênî û watedar in. Ji ber ku serdestan şoreşa intelektuel a di sumeran de çêbûye, xistiye bin sehitîya xwe, ji bo bipêşveçûna diyalektîkî ya civakan xizmet nekirine. Bi tevî vê yekê jî, ji ber ku geşedanên qerase ku bi rastê ketine, di zemîneke civakî de kûrtir bûne, loma jî bûne berhema ramana civakî. Vedîtin û birastêketina nivîsê, kiriye ku geşedanên intelektuel bi amrazên cuda pêk werin; xebatên wekî matematîk, wêje û huner encamên xebata intelektuel in. Mîtolojî, tib, astronomî, teknîk û yên din jî wekî berhemên ramanê geşe daye xwe.

Ev zengînîya ku ji sumeran belavî Grek û Îyonyayê bûye û li ser hev kom bûye, ne neyînkirina (redkirin) şoreşa intelektuel e ku di sumeran de geşe daye xwe, berevajîya wê bikûrvebirina wê ye. Ji ber hindê jî, şoreşa intelektuel a di grekan de çêbûyî jî, bo qonaxeke jortir hatiye birin û bûye şoreşa ku cudahîyek daye der. Cudahîya sereke di warê felsefeyê de derketiye holê. Awayekî nû yê têfikirînê û sîstema ramanê bi pêş xistiye. Ev yek di heman demê de, ew qonax e ku ji ramanê berê xwe daye demajoya zanistî. Derbasbûna ji qonaxeke ku ji têkelîya dîn û mîtolojîyê pêk tê bo qonaxa ramîna zanistî, şoreşeke intelektuel e. Ji ber hindê ye ku ji bo famkirina ji gerdûnê û ji civakê, rê û rêbazên nû derxistine holê. Ev qonax û demajo, wekî awayekî cuda û vezelokî ya ji bo bikaranîna ramanê, dê bibe bingeha qonax û demajoyên li dû xwe. Di nivîsê de, êdî elfabe tê bikaranîn û wêje, huner û hunera birêvebirinê jî bi pêş ketine. Zanista fizîkê, mantiq, matematîk, dîrok û tib derketine holê.

Van geşedanan hemû, yên li Mezopotamyayê, li Greko Romenê, li Asyayê, li Efrîqayê û li Emerîkayê çêbûne, li Ewropayê li ser hev kom bûne û bi saya şoreşên sanayî û endustrîyê, şoreşa intelektuel birine asta bandevê. Hemû paşxaneyên vê demajoyê, piştre ketine bin pawana netewedewletê û geşedan û bipêşketinên qerase yên wekî huner, wêje, fizîk, tib, biyolojî, kîmya, teknolojî, zanistên civakî, felsefe, çand û hwd., entegreyî demajoya netewedewletê hatine kirin. Jê û şûnde, li Ewropayê, demajoya intelektuel bi temamî bûye amrazeke sermiyanê, ji ber xizmeta civakê derketiye, ji bo bikaranîna li dij civakê hatiye berbelavkirin û bûye sedem ku sîstemeke hegemonîk a navendEwropa çêbibe. Zanistparêzîya pozîtîf, a ku zanistên sirûştî

daxistine ser asta zanistên civakê û li civakê ferz kirine, ketiye ber xizmeta pawanên sermiyanê û ji ber hindê jî, krîz bi kûr de çûne. Şerên Dinyayê yên yekem û duyem encamên van krîzan in.

**Paradîgmaya nû ya ku bi sosyolojîya azadîyê bi pêş ket**

Divê em di warê zanistên civakî de, Fêrgeha Frankfurtê ku gava zanistparêzîya pozîtîf di krîzê de ye geşe dide xwe û pê re jî Fêrgeha Annalesê, wekî demajoyeke ku tezên nû tên bipêşxistin, binirxînin. Gengeşeyên zanista civakî ku di vê demê de geşe didin xwe, xwe spartiye fizîka kuantumê (fizîka çendanî) û bûne rêçika bipêşketinên nû. Bi taybetî, divê em bipêşketina şoreşî ya di fizîka kuantumê de qewimî, dîsa wekî encameke hewldanên entellektulî binirxînin. Gengeşeyên zanista civakî ku bi rexneya Ewropayê û navendên Sosyalîstên Reel çêdibin, ji ber ku sîstemeke alternatîfa kapîtalîzmê peyda nabe, ketine demajoya entegrebûna bi kapîtalîzmê re, pê re berdewam kirine û di vê demajoyê de jî, li ser navê gelan, bipêşketinên pêwîst çênebûne. Çêdibe ku em demajoya piştî şerê dinyayê yê duyem wekî serdema salên di navbera1968 û 1970yî bi nav bikin. Tevgerên feminîst ku di vê demajoyê de geşe didin xwe, tevgerên ekolojîk, tevgerên çand û demokrasîyê, tevgerên ciwanan, her çend ji bo bipêşketina şoreşekê bûbin zemîn jî, encameke alternatîf bi xwe re çênekiriye. Intelektuel û rewşenbîrên ku serkêşî li vê demajoyê kiriye, wan modela heyî wekî sedema krîza heyî qebûl kiriye û ji ber hindê jî, wan bêsîstemî bi pêş xistiye û pêşniyaz kiriye. Loma jî, ev demajoya ku wekî demajoya postmodern tê binavkirin, kiriye ku modernîteya kapîtalîst bêhn ji xwe berde û bûye demajoya entegrebûna li modernîteya kapîtalîst. Demajoya di navbera salên 1968 û 1970yî de, her çend wekî hewldaneke intelektuel bi pêş bikeve jî, ji ber pêşniyazên sîstemê ku hatin gotin, bi kêrî modernîteya kapîtalîst hatiye.

Demajoya postmodernîteyê, ji ber vê sedemê, wekî laş û zihnîyetê nebûye asteke ku bi ser asta modernîteya kapîtalîst ketiye. Alîyê baş ê vê demajoyê ew e ku zihniyeta navendRojava û zihniyeta sosyalîsta reel daye ber pirsyaran. Ev dem, êdî ew demajo ye ku hatiye famkirin, kana esasî ya van rûdanan ne Rojava ye û ev dem, li dij nêrîna navendRojava wekî derblêdanekê bi pêş dikeve. Lê belê, ji bo krîz û boranên ku modernîteya kapîtalîst dikeve nava wan jî bûye dergeha têderketinê. Ji ber ku nehêlaye sîstem birûxe, bêhn pê daye berdan, sîstem tamîr kiriye û kiriye ku sîstem bibe domdar. Ev dem, bi bipêşketina fînans kapîtalê ve jî girêdayî ye.

Divê mirov her sê demajoyên bipêşketina kapîtalîzmê baş pênase bike ku wekî merkantîlîzm, endustrîyalîzm û fînans tên binavkirin. Mirov dikare merkantîlîzmê, ya ku beranberî netewedewletê ye, wekî awayê herî req ê demajoya netewedewletê binirxîne. Herçî demajoya endustrîbûyînê ye, demajoya tabûbûna netewedewletan e. Gava dem dibe ya fînansê, krîzên ku li sîstemê diqewimin, pêwîstîya çareserîyên dîtir bi xwe re anîye. Di vê demê de ku desthilatdarîya dinyaya daringî pawana dinyayê bi pêş dixe, sosyolojîya pozîtîf nekarîye bibe bersiva van hewcetîyan. Ji ber hindê jî, hegemonyaya pawana fînansê rasterast bi derketina holê ya sosyolojîya modern ve

girêdayî ye. Serdestîya pereyan, kiriye ku serdestîyeke jiwêdeyî netewedewletê pêwîst be. Hegemonyaya netewedewletê, li ber fînans kapîtalê wekî kendûbend disekine. Va ye, serdema postmodern, pir xweş rastî vê demê tê.

Ji bo ku ranêzîkîya zanista civakî ya alternatîf a paradîgmaya şarezayîya demokratîk xweşikî were famkirin, ev pênase û dahûrandin tên kirin. Heta ku demajoyên sosyolojîya pozîtîf û sosyolojîya postmodern neyên famkirin, sosyolojîya azadîyê nikare geşe bide xwe. Ji bo ku mirov bikare bi zelalî deyine rastê ku zihnîyetên modernîteya kapîtalîst û demajoyên sosyolojîya postmodern têkçûne û divê demajoya bipêşketina paradîgmaya zanista civakî ya nû çi ji xwe re bike esas, divê mirov demajoya salên di navbera 1968 û 1970yî de baş fam bike. Ji ber ku modernîteya kapîtalîst ketiye nav demajoyeke nû ya restorasyonê û demajoya vê restorasyonê hîna jî didome. Em bêgav in, qonaxa ku em tê de dijîn wekî krîzên sîsteman rave bikin û divê em bibînin ku ev demajoyên bikrîz ku ji ber krîza intelektuel çêdibin, dikarin bi şoreşeke intelektuel a nû werin çareserkirin. Paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û parêzvana azadîya jinan a ku Serok Öcalan danîye rastê, di gel ku şoreşa intelektuel di xwe de dihewîne jî, paradîgmaya nû ya civaka dîrokî jî bi pêş de anîye. Heke zimanê bipêşveçûna dîyalektîk ya civaka dîrokî were şopandin, divê zihniyeta şarezayîya demokratîk ya ku hatiye bipêşxistin, wekî şoreşeke intelektuel were pênasekirin û ev yek ji bo rêzgirtina bo dîrokê şert e. Di gel modela sîstema birêxistinkirî ku ji vê hêlê ve hat bipêşxistin, divê mirov destnîşan bike ku serdemeke nû ya intelektuel dest pê kiriye, lê belê ev serdem têra xwe û xweşikî nehatiye famkirin.

Alîyê herî giring yê nirxandina vê demajoyê ew e ku şarezayîya çîndar, hiyerarşîk û bidewlet piştî salên 1970yî ketiye nav demajoya restorasyoneke nû. Dewleta ku bi dewletên bajêr ên Sumerê dest pê dike, di dema asûran de berbelavtir dibe û bi Greko Romenê berdewam dike û bi neteweya dewletê re dibe xuyangeke nû, piştî salên di navbera 1968 û 1970yî de ketiye nav demajoyeke nû ya restorasyonê. Ev demajo çendî serketî be gel dê ew çend winda bikin. Va ye, ji ber vê yekê ye ku bipêşketina şarezayîya demokratîk a ku wekî Sosyolojîya Azadîyê tê binavkirin, xweyî giringîyeke dîrokî ye. Serok Öcalan, ji vê demê û şûnde, dipirse û dibêje; di serî de hemû têkoşînên ji bo azadî, wekhevî û demokrasîyê ku di dîrokê de hatine kirin, têkoşînên ku ev dused salên dawîyê tên kirin, mirovên bindestkirî, gel, netewe, tevger, siyaseta çepgir, felsefenas, akademisyen û intelektuel "**ji bo vê krîzê çi bersivê didin?**"

Gelo ev derdor, çi bersivê didin vê krîza sîstemî û pê re jî krîza intelektuel? Gelo kesên bindestkirî û yekeyên şarezayîya demokratîk, bi kîjan siyaset, bi kîjan amrazên têkoşanê û bi kîjan alternatîfan bersivê didin sîstema çîndar, hiyerarşîk û dewletperist? Serok Öcalan, wekî bersiv Şarezayîya Demokratîk derpêş dike ku li ser rêgezên azadîya Zayendê, Ekolojîk û Demokratîk ava dibe. Şarezayîya Demokratîk, wekî encama jêqetîna xwe ya ji laş û zihniyeta şarezayîya dewletperist, li ser rêgezên demokrasîyê, li ser civaka ekolojîk, li ser xeta azadîya jinan û li ser ekonomîya piştevan ku bi zihniyeta nû tê pênasekirin, ava dibe û navê têkoşîna xwebirêvebirinê û pîvana wê ya demî û şûngehî (mekanî) derdibire. Her wisa, Serok Öcalan, wekî alternatîfa netewedewlet,

endustriyalîzm û kapîtalîzmê ku her sê siwarên mehşerê yên modernîteya kapîtalîst in, wekî bersiv; neteweya demokratîk, eko-endustrî û ekonomîya grûp-komel a piştevan derpêş dike. Piştî ku pirsyarkirinên hûrûkûr ên di zanista kuantumê û di pey re jî di zanistên civakî de çêbûn, Serok Öcalan, li ser navê gelan, bi wateyeke paradîgmayî, bi modeleke nû ya birêxistinbûnê bersivê dide. Modela birêxistinî ya sîstema alternatîf, awayê birêxistinbûna konfederal a demokratîk ku sîstema demokratîk a civaka ku ne dewlet e bi pêş dixe, bi kûr ve dibe û derxistina dewletê ya ji jîyana civakî pêşniyaz dike.

Bi kurtayî, sîstema konfederal a demokratîk dê bibe sîstema herî baş a ku dê dijberên sîstemê -an ku yekeyên şarezayîya demokratîk- bikarin xwe tê de derbibirin. 'Konfederalîzma Demokratîk, birêxistina wê neteweya demokratîk e ku ne dewlet e.' Êdî wekî bêgavîyekê li ber me ye ku divê kêm zêde ji sedî notê civakê ku yekeyên şarezayîya demokratîk in, bi awayê konfederal werin birêxistin û tev li vê sîstemê bibin. Xeleka esasî ev der e. Heke civaka çîndar û xweyî dewlet ev çend birêxistinkirî be, ev çend amrazên wê yên qerase hebin, divê yekeyên şarezayîya demokratîk jî birêxistî bin, di ser hîmên piranîparêzîyê re xwe bi pêş bixin, xwe bigihînin asta zihniyeta neteweya demokratîk, sîstema konfederalîst a demokratîk bi rê bixin û civak jî bibe kirde. Her wekî di dîrokê de jî wisa çêbûye, hebûna herî bihêz, birêxistinbûyîna gel e ku xwe bi rêxistin kiriye û li ser sîstemekê ava kiriye.

Yekeya neteweya demokratîk ku yek ji yekeyên şarezayîya demokratîk e, yekeyeke hişmend e ku li hemû derên Kurdistanê xwe bi rêxistin kiriye. Lê belê, ne gengaz e ku ev yeke bikare xwe di nav sînorên Kurdistanê de ava bike û tê de bi ser bikeve. Ji berevajîya zimanê jîyanê ye ku tenê di nav sînorê xweavakirinê de bimîne. Çi gava bikare xwe pirtir bike, bibe herêmî û gerdûnî ancax wê gavê dikare bi ser bikeve. Berî her tiştî divê mirov bi vî awayî bifikire û ramana xwe jî wisa çêke. Hekena mînakên neyînî yên di dîrokê de qewimîne, dê careke din jî dubare bibin û gel dê bêhêvî û bêalternatîf bimînin. Tew jixwe qanûna jîyan û civakê pirtirbûn e. Ji klanê heta bi hozê, ji eşîrê heta bi qewmê û ji wir jî heta bi demajoya neteweya demokratîk, pirtirbûna civakê li ser van esasan e. Tiştekî bivênevê ye ku bi feraseta xwemezinkirinê, xwe ji neteweya demokratîk bigihîne asta sîstemeke kûrewî, ji herêmîbûnê xwe bigihîne gerdûnîbûnê û xwe bike laş û beden. Zimanê jîyana civakî, lê dike ferz ku neteweyên demokratîk xwe veguherînin ser awayê neteweya dinyayê ya kûrewî. Divê ev rastîya ku sosyolojîk e, were dîtin. Serdestan ev rastîn dîtiye û haya wan ji vê yekê çêbûye. Lê belê, gelên bindestkirî ku divê ew vê rastîyê bibînin, sed korayî, hem hîna nedîtine, hem jî jîyaneke ku dûrî vê rastînê ye diqedînin.

Konfederalîzma Demokratîk a Rojhilata Navîn, Yekîtîyên Konfederal ên Dinyayê, ancax dikare li ser vê feraseta pirbûnê were avakirin. Ev yek tenê bi bêjar (discourse) û gengeşîyan çênabe. Divê bingeha van bêjaran were danîn, avakirin û tijekirin. Ji bo van yekan jî, divê em baş bizanin û fam bikin ka peywirên intelektuel, polîtîk û rewiştî ku peywirên hîmî û esasî ne, di dîrokê de çawa bi pêş ketine û serketin di wan de hatine bidestxistin. Tekane rêya qetîna ji şarezayîya çîndar û dewletperist ew

e ku divê ev peywir bi tekûzî werin bicihanîn. Tiştekî pêwîst e ku yekeyên avakirina demokratîk ên li Kurdistanê bi vê hişmendîyê tev bigerin û paradîgmayên ji yek kesî bigihînin bi milyonên kesan. Divê navgîn û amrazên ramanî yên vê yekê ava bikin, pirbûna maddî û manewî pêk bînin û xwe bigihînin sîstema kûrewî.

Şarezayîya dewletperist û desthilatperist, ji Urukê bi vir ve ye, ji bo ku xwe biparêze û heyî bike, rêbaza pirbûnê û veguherîna ser sîstemeke navneteweyî û kûrewî bi cih anîye. Ji ber hindê ye ku desthilatdar heta tu bibêjî bes bi hişmend û bi pîlan tev gerîyane. Herî zêde hêzên serdest tê gihîştine ku xweparastin û xwemayîndekirin ancax bi rêya pirbûnê gengaz e.

Divê em bala xwe bibin ser Şoreşa Rûs ku li ser navê bindestkirîyan çêbû, wekî yekeyek şarezayîya demokratîk bi rêbazeke çawa xwe pirtir kir. Li ser navê parastina welatê bav û kalan, hemû şoreşên çînî û têkoşînên bo rizgarîya neteweyî ji bo xwe kirine amraz. Armanca sereke ya yekeya Sovyetan ne pirtirbûn bûye lê parastina welatê bav û kalan bûye, ji bo vê jî, di siyaseta derveyî de hemû hêzên demokratîk û hemû geşedan wekî amraz hatine bikaranîn. Ji ber hindê jî, yekeyên Sovyetê li şûna ku xwe pirtir bikin, têkoşînên sosyalîst ên heyî kirine amraza siyaseta derveyî û ew wisa fikirîne ku parastina welatê bav û kalan dê li ser vê bingehê çêbibe û wan di vê yekê de şaştî kiriye. Bi vî awayî, gelek tevgerên civakî û rizgarîya neteweyî ji xwe re kirine destikê kêrê, entegreyî sîstema xwe kirine, nekarîne welatê bav û kalan jî biparêzin û ji hev belawela bûne.

Şoreşa Rojavayê, şoreşeke wisa ye ku bi zihniyeta paradîgmaya şarezayîya demokratîk çêbûye. Rojava yekeya şarezayîya demokratîk e û ji bo ku heyî bibe, divê pirtir bibe û bibe gerdûnî û divê were famkirin ku ancax dikare bi vê rêbazê were parastin. Wekî çawa yekeya şarezayîya dewletperist ji Urukê veguherîye ser gerdûnîbûnê û gelek navendên di zik hev de ava kirine, yekeya şarezayîya demokratîk a li Rojavayê avakirî jî, dikare bi xwepirtirkirinê, bi xwemezinkirinê û bi xwegerdûnîkirinê xwe heyî bike. Ji ber nexweşîyên zihniyeta çîndar, hiyerarşîk û dewletperist, wekî çawa yekeya Sovyetan ji hev belav bûye, nexweşîyên heman zihnîyetê ji bo demajoya Rojavayê jî lidar in. Divê bal li ser vê yekê be û şaştîyeke wisa neyê kirin. Divê ji bo xatirê Rojavayê parçe û yekeyên dîtir ên şarezayîya demokratîk nekin qurbanî û xwe bigihînin hêz, yeke û kesên dijber ku çêdibin û di çarçoveya sîstema şarezayîya demokratîk de, bi hev re, xwe mezintir bikin. Sîyaseta 'her tişt ji bo Rojava'yê, sîyaseta Sovyetê ye û encama wê jî li ber çavan e. Hemû refleksên parastinê ku li ser navê 'Em Rojavayê biparêzin' tên nîşandan, heke bi rê û rêbazên pircureyî neyên bipêşxistin û berbelavtirkirin û bi Rojavayê sînorkirî bimînin, ew ê talûkeyeke bi vî rengî di xwe de bihewînin û ji têkçûnê re bervekirî in. Ji ber ku ev refleks dê bibe sedema dortengbûnê û qetînên ji tevdehîyê dê çêbibin.

Şoreşa Rojavayê, ji serî de, dikare hevgirtina gelên Rojhilata Navîn çêke, bi awayekî berwarî zemîn û mezinayîyekê bi dest xwe ve bîne û bi vî awayî êrîşên hêzên netewedewletên mêtinger û modernîteya kapîtalîst bi avê de bibe. Divê bê zanîn ku pawanên kapîtalîst dê bi hêz û amrazên xwe yên mezin, destûra vê yekê nedin û kend

û bendan deynin berê. Ranêzîkîyên polîtîk ku didin der, vê yekê pir baş nîşan didin. Kêrhatî ye ku em dubare bikin; rêya parastina Şoreşa Rojavayê, pirtirbûn û xwegerdûnîkirin e. Ji ber ku yekeya neteweya demokratîk ku yekeya şarezayîya demokratîk e, li Rojavayê şoreşek kiriye, pêwîstî pê çêbûye ku ev nirxandin werin kirin. An na, paradîgmaya şarezayîya demokratîk, ji armancên stratejîk ên têkoşîna me ye û armanca azadkirina mirovahîya dinyayê bi vê paradîgmayê gengaz e. Şoreşa ku bi pêş dikeve, dikare bibe zemîna vê yekê û her wisan dikare ji dîrokê dersan çêke, xwe pirtir bike û veguhere sîstemeke herêmî û kûrewî.

Gava armanca pirtirkirina paradîgmaya şarezayîya demokratîk û kûrewîkirina wê were pêkanîn û ranêzîkîyên berteng û dogmatîk çêbibin, divê ew werin mehkûmkirin. Di dema xebata pirtirkirina paradîgmaya şarezayîya demokratîk de, ranêzîkîyeke zêde ya wekî ‘bila di bin sehitîya me de çêbibe’, ranêzîkîyeke berteng û dogmatîk e. Wekî çawa gava her pêkhate xwe bike eznavend wê ev yek bibe sedema bertengbûnê, ranêzîkîyên pir zêde navendparêz jî ku ji zimanê sîstema konfederal dûr in, dê bibin zemîna çêbûna heman encaman. Rêya bipêşketin, bikûrveçûn û pirtirbûnê, pîverên bilind û rê û rêbazên afirîner jê re divin. Gava sazîyên avakirinê ku yekeyên şarezayîya demokratîk in, berveyî hundir û di nav sîstemê de bi pêş bikevin, ev yek dê bibe sedem ku refleksên paradîgmayî qels bibin û pê re jî veneguherin ser sîstema konfederalîzma demokratîk û di nav sînorên mekanîzmayeke berteng, teknîkî û rêxistinî de bimînin. Heman yeke, gava xebata berbelavtirkirin û pirtirkirina paradîgmaya Serok Öcalan bikin û bi refleksên berteng û siyaseta rojane ranêzîkî li xebatan bikin jî, ev yek dê bi heman awayî bibe sedema bertengbûn, piçûkbûn û rûtînbûnê. Gava yekeya şarezayîya demokratîk di hundirê xwe de berteng û piçûk bibe û ji derveyî xwe jî bi awayekî neşênber û giştîkir be, divê li dij vê pêdeçûnê, hem li hundir hem jî li derve, li gor esasên paradîgmayê, ji nû ve, geşedanên nû bi cih bîne. Ranêzîkîyên şaş ên derdikevin rastê, ew ranêzîkî ne ku bi zimanê xwepirtirkirina jîyanê û civakê re li hev nakin. Ji ber qonaxa ku xebata azadbûnê gihîştiyê, divê ranêzîkîyên li ser tirs, şayîş û qilqilînê ku ne ji bingeheke civakî ya xurt in, nekevin pêşîya têkoşînê û divê ev taybetî li hêlekê werin hêlan. Ji ber ku ev taybetî li pêş mezinbûnê, kend û bendên sereke ne. Eger bi awayekî rolpêdan û bimîsyonkirina dîrokî ranêzîkî li çêbûn û pirtirbûna paradîgmayê were kirin, kakil û puxteya meseleyê dê kûrtir were famkirin. Her wekî di dîrokê de, gava şoreşên intelektuel, yeke û fikir pirtir bûne û veguherîne ser sîstemên gelemperî û wan mîsyonek li xwe bar kiriye, di serdema me de jî, divê wekî pratîkkirina divêtîyên mîsyoneke dîrokî li van xebatan were nihêrîn. Ev yek mîsyoneke dîrokî ye. Rêya mezinbûnê ji vir e. Bê guman, divê bi pîvanên bilind, rêbazeke afirîner û heta tu bibêjî bes vezelokî, were peydakirin.

Ne ji nêzîktêdayîna me ye ku em misêwa behsa rêbaza desthilatê bikin û mînakan jê bidin, ji bo wê jî divê bêyî ku em bi alî pragmatîzmê ve bişiqitin, li ser hîma dersjêhildanê bala xwe bidinê. Sîstema hiyerarşîk û dewletperist ku zimanê civak û jîyanê baş ji hev derxistiye û jê fam kiriye, gava sîstema xwe bi pêş xistiye, xwe pirtir kiriye, bi wateyeke tengkirinê, ranêzîkîyeke wê ya wisa ku bibêje ‘bila her tişt di bin

sehitîya min de be’ tune ye. Kî sîstema desthilatê berbelav dike, kîjan hêz wê berbelav dike, dikare berbelav bike. Der heqê armanc û rêbazê de, tu qilqilîn, şayîş û tirseke wê tune ye. Armanc berbelavkirina desthilatê ye. Bi qasî ku di senaryoya Efendîyê Gustîlkan de dide der, perspektîfa wan ev e; gustîlk bo her kesî tê dîyarîkirin, bila sîstema wan bigihîje wêdeyî û derveyî sînorên wan, çi dibe bila bibe. Armanc berbelavbûna desthilatê ye. Ji ber vê yekê ye ku desthilat, bi awayekî berbelav têkilîyên civakî û awayên wan bi kar tîne. Bi wateyeke dîrokî, ketiye nav têkilîyên sirûştî û kevneşopî yên civakan û xwe berbelavtir kiriye. Heke em bala xwe bidinê em ê bibînin ku roja îroyîn, desthilat di her kunik û çavikên jîyanê de serdest e. Halwe, ev kunik û têkilî, ew awayên têkilîdanînê ne ku jîyana civakî ew peyda û ava kirine û avakirin jî ji derveyî desthilatê hatiye kirin. Heman rêbaz, ji bo teknolojî û dinyaya înternetê jî lidar e. Bi rêbaza vîrûsê dikevin nav programên amrazên teknîkî û komputerên ku mirov bi kar tînin û agahîyan bi dest dixin. Ne gengaz e mirov bergirîya vê yekê bike. Ji bo vê yekê, desthilat, têkilîyên civakî û teknolojîk ên her cureyî di asta herî baş de bi kar anîne û xistine ber xizmeta desthilatan.

Yekeyên şarezayîya demokratîk jî dikarin xwe pirtir bikin, bigihîjin asta sîstemeke kûrewî û xwe heyî bikin. Tekane rêya xweparastina wan xwepirtirkirin û gihîştina asta kûrewî ye. Ji ber kaosa ku di serdema me de diqewime, mirov û civak birçîyê fikirekê ne ku rê li ber wan bixe û pêwîstîya wan pê heye; û ev pêwîstî zemîna civakî û sosyal a mezinbûnê pêk tîne. Em ji têkilîyên civaka sirûştî û yên kevneşopî bigirin heta bi têkilîyên ku hewcetîyên sereke yên civakan diqedînin, gava mirov her curerêbazên ketina nav damarên tenik ên civakan bi kar bîne, hem awayên têkilîdanînê yên heyî bi kar bîne hem jî awayên nû yên têkilîdanînê peyda bike û wan têkilîyan bike tora jîyana azad, ev yek dibe avakirina rêyên sereke yên xwepirtirkirinê. Divê mirov bi awayekî berbelav, bi awayên sazîyî, grûpî û kesaneyî têkeve nav hemû qadên civakan, di nav têkilîyên civakî yên heyî de bi cih bibe û têkilîyan berbelavtir bike û wan têkilîyan veguherîne û têxe ber xizmeta xwepirtirkirinê. Ji bo vê yekê jî, heke gengaz be, divê bikare bi sedan, bi hezaran sazîyan ava bike û têkeve nav xebata danîna têkilîyên berbelavtir. Loma jî, gava awayên têkilîya sirûştî yên civakan ku ji berhemanîn û berxwarinê çêdibin û têkilîyên civakî yên afirandî bibin sazîyî, wê gavê ew ê bibin mayînde û ew ê bikarin navçîtîyê ji bo veguherîna jîyanê bikin. Ji bo vê yekê jî, divê têkilîyên civakî bi awayekî sazîyî werin birêxistinkirin û divê bibin ew hokar û avakar ku her cureçalakîyên civakê destnîşan dikin. Divê bê zanîn, rêya sereke ya gihîştandina asta kûrewî ya paradîgmaya Serok Öcalan û birêxistinkirina Sîstema Konfederal ya Dinyayê, xwepirtirkirin e. Rêbaza vê xwepirtirkirinê jî, her wekî di dîrokê de jî wisa hatiye kirin, divê xweserîya her sê peywirên sereke were parastin û bi awayekî bibandor û tekûz were bicihanîn.

Gava peywira berbelavtirkirina paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û parêzvana azadîya jinan ya Serok Öcalan, gihîştandina wê ya bo hemû gelên bindestkirî û kirina wê ya tevgera kûrewî li hêlekê bin û mirov rabe tenê li ser xebatên xwe yên avakirina civakî bisekine, tenê bi vê re bi sînor bike, ev yek sedemeke giran a xwerexnekirinê ye.

Serok Öcalan, gava ev paradîgma ava dikir, ew ji bo hemû mirovatîyê, wekî programeke azadîyê û rizgarîyê danî rastê. Hema bibêje, li hemû parzemînan, li hemû herêman, li hemû civakên bindestkirî, ev pêşniyaz kir. Bi paradîgmaya ku ava kir, banga biyekbûnê li mirovên ku dijberê sîstemê ne kir. Lê belê, ji ber ku şoreşger û rewşenbîrên ku dê ev yek bi cih bianîyana, ev paradîgma berteng û sînorkirî hêlan, negihîşt asta ku tê xwestin; belê, negihîşt asta ku tê xwestin û hem di nav civaka ku tê de şoreş hat kirin hem jî di çarçoveya dînamîkên civakî de ku em pala xwe didinê, negihîşt bîrûbawerîyên cuda yên gelan jî û nebû kirdeyek. Gel hîna jî di pozisyona 'piştgirîkirinê' ya paradîgmaya kevn de tên hêlan û ev yek dide nîşan ku bi temamî ji paradîgmaya nû nehatiye famkirin, nehatiye pejirandin û li gor esasên nû xwe serwext nekiriye. Piştî ku demajoya 'azadîya fizîkî' ya Serok Öcalan ku di 10ê kewçêra sala 2023yan de hat destpêkirin, di asta herêmî û dinyayî de berbelav bû û gihîşt asta kûrewî, bi awayekî beşkî be jî, alîyên berteng, şaşfamkirî, serobero û dogmatîk hatin şikandin û zemînek ji bo hêvîya '**dinyayeke nû gengaz e**' çêkir.

Bi heman awayî, mirovên akademisyen, rewşenbîr, intelektuel û dijberên sîstemê ku li herêmê û li dinyayê dijîn, li hember paradîgmaya azadîyê ku hat avakirin, nikarîbûn ji rewşa xwe ya 'piştgirîkirinê' wêdetir biçin. Li hember 'doza mafdar a gelê kurd û dîlbûna serokê wan' piştgirîkirin ji xwe re kirin deynek û nekarîn ji wê pozisyonê derkevin der. Halwe, divê zihniyeta paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û parêzvana azadîya jinan ku bi wateya fikirî-ramanî, intelektuelî û paradîgmayî hat avakirin, bikare li mercên berbiçav were anîn û têkoşîna xwe ya bo azadîyê bike. Gelek tevgerên kedê, partî, tevger û grûp hene. Divîya programên xwe li gor paradîgmaya nû biguherandina û bibûna piştevan. Bi heman awayî, dibe ku tevger û partîyên nû li ser vê bingehê xwe bi rêxistin bikin. Akademisyen, rewşenbîr û intelektuelên herêmî û dinyayî, dikarin li ber ronîya paradîgmaya nû, bi dirûşma '**dinyayeke nû gengaz e**', înisiyatîvên nû ava bikin, rê û rêbazên biyekkirina yekeyên ku dijberên sîstemê ne gengeşe bikin û serkêşîya vê yekê bikin. Bi heman awayî, jin û ciwanên ku serkêşîya şoreşên civakî kirine, her wekî di dîrokê de jî wisa ye, dikarin li ber ronîya paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û parêzvana azadîya jinan, rolên xwe bigihînin ast û rehendeke kûrewî û serkêşîyê bikin. Bi kurtayî, di serî de dijberên sîstemê, intelektuel, akademisyen û rewşenbîr, dikarin ji pozisyona piştgirîdana bo paradîgmaya Serok Öcalan derkevin ku rêya derketina ji kaosê ye û rêya rabihurîna krîza sîstemê ye; û dikarin hîna çalaktir tev bigerin û mîsyona xwe ya serkêşîyê bi cih bînin.

Li ser vê mijarê, fîlozof Slavoj Zizek ku mirov dikare wî di dinyaya intelektuelan de wekî mînak bibêje, nirxandina wî ya têrhewan a di rojên xwendina pirtûkên Serok Öcalan de kiriye, her wekî xwe radiguhêzim.

Zizek, "Ji bo min rûmet e ku ez ji we re du paragrafên kurt ên Öcalan bixwînim ku bi navê 'divê mirov çawa bijî, çi bike û ji ku derê dest pê bike', ye. Ev tekst, rasterast li ser pirsa, 'di nav lêmişta roja îro de, em ê bi kirdetîya xwe ve li ku derê bisekinin, şûneke kirdewarî ya otantîk çi ye' disekine ku gelemşeya sereke ya me hemûyan e. Pirsa "Divê mirov çi bike" jî, pir ji berê ve, pêncsed sal in bi hemû kitekitên xwe ve

hatiye bersivandin: Tu yê bi ferdparêzî bijî, tu yê tim li ser xwe bifikirî. Tu yê bibêjî, "Tekane rê rêya modernîteyê ye" û çi bikeve ser milê te tu yê bikî. Rê dîyar e, rêçik dîyar e: Her kes çi dike, tu yê jî wekî wan bikî. Heke tu karsaz bî tu yê qazanc bikî. Heke tu kedkar bî tu yê bidî dû heqê xwe. Wekî din, keregêjî ye mirov bide dû awayên kirinên dîtir. Heke tu pêdagirîyê tê de bikî, tu yê ji derveyî sîstemê bimînî, bêkar û betal bimînî, neçar bimînî û birizî. Jîyan kirine beza hespan a erjeng. Bersiva hevpar a ku divê mirov bide pirsên 'Divê mirov çawa bijî, divê mirov çi bike û divê mirov ji ku derê dest pê bike' ji nav sîstemê û bi dijberîya sîstemê dest pê bike. Lê belê, dijberîya sîstemê ya ji nav sîstemê, di asta ferzanên berê de, bi berdêla mirina ku li ber derî ye, şervanîya heqîqetê jê re divê. Bi awayekî ku ew ê bi 'divê mirov çawa bijî, ji ku derê dest pê bike' di zik hev de be, mîna avêtina kirasê dînîkîyê yê ku modernîte wekî zirxekî li te kiriye, divê tu bi ruhjêçûnekê dev ji awayê vê jîyanê berdî. Gava hewce kir, tu yê di her kêlîyê de vereşî û tu yê mehda xwe, mêjîyê xwe û laşê xwe ji vê jîyana ku ketiye hundirê te, pak bikî. Heke xwe wekî xweşiktira dinyayê jî nîşanî te bide jî, tu yê bi vereşîna tiştê di hundirê xwe de, bersiva wê bidî." "Ez wisa difikirim ku ev paragraf dibiriqe û hema bibêje tiştekî wisa ye ku bedewîyeke metafizîkî dide der. Dîsa koordînatên vebir ên likuderêbûna me dide. Em di sîstemekê de dijîn ku xwe wekî ferdparêz derpêş dike, divê her yek ji me, em jîyaneke xweserî xwe bijîn, ne wekî kesên din. Lê belê, di bin vê piranîbûna vala û kuşpene de, hevrengîyeke pir acizker heye. Em çi qas dixwazin xwe wekî ferdên bêhevta heyî bikin jî, em wekî her kesî ne. Baş e, divê mirov çi bike? Öcalan di vê qonaxê de, metaforeke vebir û têrbaş derpêş dike: Vereşîna sîstemê. Ev nayê wateya jinavêwindakirina hemû rastînîyê, lê belê, tê wateya ku em ê di kûrahîya kirdewarîya xwe de, ji wan koordînatên îdeolojîk ên heyî ku em tê de dijîn û wan wekî sirûştî qebûl dikin, rizgar bibin ku em di wan de asê mane." "Ji bo ku hûn têkevin nav demajoya azadbûn û rizgarîya civakî, divê hûn pêşî xwe azad bikin, divê hûn kêm zêde vê azadîyê bi dest xwe ve bînin; ev yek jî, bi temamî tê wê wateyê ku hûn ê xwe ji hemû têkçûnan pak bikin ku di zik hev de ne û îro ro jîyana me bikeys dikin. Tu dibê qey Öcalan bi van gotinan, têgihana herî kûr a teolojîya kevn a cihûyan derdibire ku teolojî dibêje; berî ku Xwedê dinyayê biafirîne, divê valahîyê bi xwe biafirîne û paşê jî tiştên ku afirandine têxe nava wê valahîyê. Öcalan, wekî materyalîstekî, wekî marksîstekî, got; ji bo ku mirov bikare dinyayeke nû ya civakî biafirîne divê pêşî pergala heyî vereşe. Qebûlkirina hebûna valahîyê, rizgarbûna ji çewisandina herî gewre ya dinyaya ku em tê de dijîn. Ev yek, hişbînîyeke (insight) metafizîkî, sosyalî ya têrbaş e. Öcalan gelek analîzên sosyal kirin, gelek tişt kirin ku di hişê kesan de bi cih dibin, lê di van her du paragrafan de, mîna ku hûn koordînatên metafizîkî yên hemû angajmanên wî bi dest xwe ve tînin. Û divê em jî di vî warî de bidin ser şopa wî."

Slavoj Zizek, di nirxandineke xwe ya din de gotiye, 'Öcalan, modelekê derpêşî me dike li ser pirsa, gelo têkoşîna wî ya azadîyê ku dimeşîne dê çawa bi têkoşîna rizgarîyê ya kûrewî re bibe yek. Ez heta dawîyê piştevanîya Öcalan dikim, ez sempatîyê derpêşî wî nakim, bi ya min divê em ji sempatîyê gavekê wêdetir biçin. Têkoşîna wî têkoşîna min e.'

Gotinên dawîn ên fîlozof Slavoj Zizek, “**û divê em jî di vî warî de bidin ser şopa wî**’ û ‘**têkoşîna wî têkoşîna min e**’, bi awayekî balkêş dide der ka divê intelektuel, akademisyen û rewşenbîr li ku derê cih bidin xwe. Tê zanîn ku di vî warî de, gelek intelektuel, akademisyen û rewşenbîr, di asteke bilind de eleqe nîşan dane û beşdarî lê kirine. Lê belê, ji ber ku înisiyatîvên sîstematîktir û berfirehtir nehatine avakirin, ev yek têr nake ku paradîgmaya wî ya demokratîk, ekolojîk û parêzvana azadîya jinan were berbelavtirkirin û pirtirkirin da ku bigihîje asta tevgereke kûrewî.

Wekî encam, em çiqasî li ser xweserîya peywirên polîtîk, rewiştî û intelektuel baldar bin ku hemû jî di zik hev de ne, divê em ewqasî jî qadên azad ava bikin da ku ew bi hevtemamkirinê tev bigerin. Bêyî ku em bikevin ber bayê feraseta bêpîvan a liberalîzmê ku dibêje her rê rewa ye, bêyî ku em bi awayekî pragmatîk nêzîkî lê bikin, divê em bi rêgezdarî lê bi awayekî nermî, afirîner û hostatîya polîtîk hizirên Serok Öcalan, di ser her sê peywiran re pirtir bikin û ev yek peywira herî hêja ye. Ji bo vê yekê, ji serî de xwendevanên Serok Öcalan û şoreşger, pê re jî intelektuel, akademisyen, rewşenbîr, hunermend, wêjekar, sosyolog, zanewer, jin, anarşîst, sosyalîst, demokrat, alimên dilrast û bawermend û yekeyên dijberên sîstemê, divê ji bîr nekin ku peywireke dîrokî li ber wan e.

**AKADEMÎYA ZANISTÊN SOSYAL A ABDULLAH ÖCALAN**
**NAVENDA LÊKOLÎNÊ YA ROJHILATA NAVÎN**